

Zanyariyên niha ser lêdana vaksîna koronayê li Nordrhein-Westfalen

Li ku dikarin vaksînê li xwe bidim?

Ji 1 meha Oktobra 2021, lêdana vaksîna koronayê li Nordrhein-Westfalen pirtir ji aliyê bijîşkên giştî û bijîşkên şirketan ve hatiye birêvebirin. Xala yekem a pêwendiyê bo kesên hez dikin vaksînê li xwe bidin niha pirtir bijîşkên giştî ye. Kesên ku bijîşkê wan ê giştî tuneye dikarin [li vir](#) nivîsgehên bijîşkên li North Rhine vaksînê lêdidin peyda bikin û [li vir](#) dikarin nivîsgehên bijîşkên li Westfalen-Lippe vaksînê lêdidin bo pêwendiyê peyda bikin.

Herwiha, 53 deverên îdarî û bajarên serbixwe torreke navendên navçeyî yê vaksînkirinê çêkirine. Li vir listeyeke navendên vaksînkirinê li Nordrhein-Westfalen heye: www.impfen.nrw

Herwiha, hejmarek xizmetên yan helmetên vaksînkirinê yê ser bingeha gerok a civakê li seranserê welêt hene.

Çima lêdana vaksîna xurtkirinê girîng e?

Her kesê ku hemberî Kovîd-19 vaksînê li xwe bide, xwe û mirovên dorbera xwe diparêze û arîkariyê dike ku belavbûna vayrusê kêmbibe. Vaksînen heya yê Kovîd-19 bi taybet hemberî nexweşiyên giran parastinê dikin. Tevî ku bi vaksînkirinê bi temamî pêşiya tûşbûna koronayê nayê girtin, lê kesên vaksîn li xwe dane û tûş dibin metirsiya wan a belavkirina vayrusê kêmtir e, loma ew metirsiya pêxistina kesên din kêmtir dikin.

Lê, lêkolînên vê dawiyê nîşan didin parastina vaksînê hemberî tûşbûna koronayê bi taybet li kesên extiyar yan kesên pergala wan a ewlebûnê lawaz de hêdî hêdî kêmtir dike. Wekî din, di mirovên pîr de, piştî vaksînlêdanê bi giştî bersiva sîstema berevaniyê leşê kêmtir e. Di vê rewşê de, lêdana vaksîna xurtkirinê dikare bi awayê berbiçav dîsan parastina vaksînê xurt bike, wek mînak bi şiklê anîbodî. Lêdana vaksîna xurtkirinê wekî xurtkar (Bi Ingîlîsî: Booster) kar dike bo pergala ewlebûnê – loma jê re lêdana vaksîna xurtkirinê dibêjin.

Kingê lêdana vaksîna xurtkirinê tewsiye dibe?

Wezaretê Tenduristiyê ya Nordrhein-Westfalen niha vaksîna xurtkirinê bi navbera **herî kêmtir pênc mehan** piştî doza dawîn a ewlebûna bingehîn tewsiye dikin. Lê, yê jêrê bi kar tên: Wekî beşeke bernameyên vaksîna şaredariyê, kesên ku vaksîna wan a bingehîn herî kêmtir çar mehan berê bûye jê dikarin dozeke xurtkirinê wergirin.

Ev ser biryarên ferdî ser bingeha nîşaneyê bijîşkî bo lêdana vaksîna xurtkirinê ya zûtir bandorê danayîne, bi mercê ku navbeyna herî mêm ya çar hefteyan di vê yekê de derbas bûbe. Lê, ev navbeyna herî kêmtir a çar hefteyan bi zelalî nayê tewsiyekirin, lê pêdiviyê kêmtir a teqez bo biryarên rewşên ferdî ye. Ev navbeyna vaksînê ser bingeha tewsiyeyê niha ya Komîsiyona Hertimî ya Vaksînê (STIKO) li bara vaksîna KOVÎD-19 ye, ku wek mînak, vaksîneke xurtkirinê dikare herî zû çar hefteyan piştî vaksîna duyem e ku carên vaksînê li kesên ku pirsgirêkên wan ên pergala ewlebûnê heye û ihtimal e bersiva wan a vaksînê gelekî kêmtir bibe.

Kî dikare lêdana vaksîna xurtkirinê wergire? Komîsiyona Herdemî ya Vaksînlêdanê (STIKO) lêdana vaksîna xurtkirinê digel vaksîna mRNA (bi gelemperî bi demên şeş mehî piştî vaksînlêdana duyem) bo hemû kesên 18 salî û jortir tewsiye dike.

Lê, komên taybet ên gel divê wekî ewlewyet lêdana vaksîna xurtkirinê wergirin. Ev ew kes in pirsgirêka ewlebûna wan heye, kesên 70 salî û jortir, niştecih û kesên li navendên bo extiyaran in, û karmendên dezgehên bijîşkî û perestariyê ku digel kesên hesas pêwendiya wan a rasterast heye. Kesên ku vaksîna Koronaayê li xwe nedane, ew jî divê wekî ewlewyet vaksîna bingehîn li xwe bidin.

Kîjan vaksîn bo lêdana vaksîna xurtkirinê bi kar tên?

Tenê **vaksînen mRNA (Biontech, Moderna)** bo lêdana vaksîna xurtkirinê bi kar tên. Tenê ev du vaksîn li Almaniyayê bo lêdana vaksîna xurtkirinê destûra wan heye. Eger vaksînlêdana bingehîn bi vaksîna mRNA hatibe kirin, heman vaksîn divê bo lêdana vaksîna xurtkirinê were bikaranîn. Eger ew vaksîn tunebe, dikarin vaksîna din bi kar binin. Bo kesên jêr 30 salî, lêdana BioNTech bi gelemperî tewsiye dibe. Ev bo vaksînlêdana bingehîn û lêdana vaksîna xurtkirinê jî durist e.

Li ku dikarin vaksîna xurtkirinê wergirin?

Tîmên gerok ên vaksînlêdanê, bijîşkên giştî, bijîşkên şîrketan, navendên vaksînlêdanê û xizmetên gerok ên vaksînlêdanê vaksîna xurtkirinê lêdidin. Li vir listeyeke navendên vaksînkirinê li Nordrhein-Westfalen heye: www.impfen.nrw

Min vaksîna AstraZeneca yan Johnson&Johnson li xwe da. Gelo dikarin dîsan vaksîna xurtkirinê li xwe bidim?

Bo kesên cara yekem a vaksînlêdanê bi vaksîna Johnson&Johnson li xwe dane, STIKO vaksîna mRNA ji hefteya çarem piştî lêdana vaksîna Johnson&Johnson tewsiye dibe, û vaksîna xurtkirinê divê 6 mehan piştê bo herî zêdekirina parastinê were lêdan.

Kesên cara yekem vaksîna AstraZeneca li xwe dane jî dikarin vaksîna xurtkirinê ya mRNA şeş mehan piştî vaksînlêdanê duyem li xwe bidin. Heman tişt bo wan kesan jî durist e ku vaksînen cur bi cur li xwe dane (Vaksînlêdan 1: vaksîna Vector + + Vaksînlêdan 2: vaksîna mRNA).

Gelo vaksîna xurtkirinê belaş e?

Erê. Hemû vaksînen koronayê belaş in. Ev bo vaksîna xurtkirinê jî durist e.

Min vaksîna anflûanzayê jî li xwe daye. Gelo ev bi vaksîna xurtkirinê re li hev dike?

Erê. Vaksîna anflûanzayê dikare digel vaksîna koronayê were lêdan.

Vaksîna bo zarokên nava 5 û 11 salî

Gelo vaksîna Koronayê jî bo zarok û nûciwanan tewsiye dibe?

Piştî berçavgirtina hemû daneyên heya niha hene, **STIKO vaksîna Kovîd-19 bo zarokên pênc heya yanzdeh salî bi nexweşiyên curbecur ên berê tewsiye dike.** Herwiha, vaksîn bo wan zarokan tewsiye dibe ku bi kesên bi metirsiya pêvajoya gurr a Kovîd-19 re pêwendiya wan heye û bixwe jî nikarin bi vaksîne werin parastin yan nikarin bi başî werin parastin (mînak, kesên extiyar û kesên bi pergala ewlebûnê ya lawaz). Dîsan jî, zarokên 5-heya-11 salî yên bêyî

nexweşiyên berê jî dikarin hemberî Kovîd-19 û piştî berhevkirina zanyariyên guncaw ên bijîşkiyê werin vaksînkirin, eger zarok û dayîkbav yan serperestên qanûnî bixwe hez dikin wisan bikin.

Zarok bi kîjan vaksînê derzî dibin?

Heya niha, tenê derziya mRNA Comirnaty® ya BioNTech bo vaksînkirina zarokên pênc heya yanzdeh salî erê bûye. Ev vaksîn ji hêla doz, tîrbûn û pêkhatayan ve ji vaksîna BioNTech bo kesên 12 salî û jortir cuda ye. Bi giştî 2.4 milyon doz vaksîna zarokan dê li meha Kanûnê bidin dewleta federal. Dozên yekem ên vaksînê berê dane bijîşkên zarok û nûciwanan.

Ez hertim dixwînim ku pêvajoya koronayê li zarokan de hinekî aram e. Gelo bi rastî pêwîst zarokên xwe vaksîn bikin?

Vaksînkirina zarokan dikare arîkar be parastina civakê zêde bibe. Wek mînak, ji zarokan re dijwar e ki çalakiyên rojane yê dibistanê yan dema hevdîtina hevalan jev dûr bimînin. Vaksînkirina kesên ciwan pêşiya belavbûna vayrusê nava wan de digire. Ev ne tenê wan ji nexweşiya ihtimalî ya giran, lêbelê kesên bi wan re pêwendiya wan heye, yan metirsiya zêde ya nexweş ketinê heye, yan ku nikarin werin vaksînkirin, diparêze. Wek mînak, ev kes muqatekar in ku berê nexweşî yan alerjiya wan hebûye ku vaksînkirina hemberî nemimkin dike.